Ji dema ku Da'ış derketiye, li ser dika siyasetê, hilkişandina wan ser dimena civakî û siyasi, bi qefan şervan tevlî wan bûn, û hêzék xurt, bi hejmarek mezin bêhtirin ji Erebân, Erebên Sune, di vê herêma navbera Sûrya û İraqê de, û bi lez cih û zemîn û parêzgeh standin, bû cihê pîrsê ji hemû xelkan re, nexasim zanyarên Ereb û yên Europa û Emerikan, ku van bi lez lê bez nas bikin!?. Mixabin tenê zanyarên Kurda yê ku gerekke beri tevan ew Da'ış nas bikin û xepartînê li ser çekin, lê talda xwe dane vê tevgera ku dijwari Kurd êşandine, û neketiye.! Bala wan tu şiroveyan li ser vê tevgera Radikal çekin û wan nas bikin. Dixwazim wek Kurdekkî serî têxim naveroka van hovan de, bê çawa çebûne? û kî li pey wan e? kî bêhtir ji wan qezencê dike? Tiştâ ku bêhtir xeyala mirov dikşîne pîrseke giringe çima Da'ış anha derket? di qonaxa salen şoreşa ku navê Buhara Erebî lê dikirin, gelek pîrs hene mane bê bersiv, û ne yek ji konevanê kurd jî yê sûri li van pîrsa vegerandiye? Mirov dixwest ji tevgera Kurdi bipirsya û he wisâji nivîskar û rewşenbiran jî, gelo hûn çawan van hovan di nerxîn?! Heger wan nas dikin, û ne bawer im ku wan nas dikin, ma gelo ji me re em wek gelê kurd giring e ku em diroka tiştan zanibin, serserê tevî diroka dijiminê xwe, ku Da'ış Dijminek tûj û dijwari bi serê me kurdan de anî,



çawa evqas qad û zemîn ji Sûryê û İraqê stand di rojêñ hindik de, Kê rê jê re vekir ku bighê Kobanî, wêran bike, bi erdê ve rast bike, û nêzî 300 gundê kurdan vala bikin . ya din çima berê wan kete Şingalê, û hemû dever lê wêran kirin, kî berê Da'ış dide Kurdan? Ma rast e nizanin ku Kurd Misulmanê Sune ne û Şafîhi ne? yan daxwaz jê qirkirina me bû, ku yê ji me jî bîmîne sax, bibe qe-reçiyê nû li dinê belawelakin be. Ya din çawa gihaye Libyayê, û Felata Misrê Sinaa, û Tûnis ê, ta Boko Heramê. Ya ji tevî bêhtir û pîwîst divê mirov nas bike ka armanca wan ci ye? û kete Yemenê de û serê xwe rakirin li Cezai-re, û hêdi hêdi mîna kullîyan li hemî deveren Erebân pir bibin. Şaşitiyeke mezin e ku em Da'ış veçetin jî bûyerên ku li rojhîlata navîn diqewimin, û nexasim em hin sedemîn dirokî bidin alî, ku jê re bingehin, û ya din ku ev birrê han di mislîmantîyê de heye bi vê tûjbûnê. û kiryarê xerab wek serjekirinê, şewitandina dijiminê xwe, ne nû ye di diroka mislaman de. Mirov xwe dixapîne ku diroka Xilafeta İslâmî, ji kesê Ereb re ne derd e ku lê vegere, ev diroka han ku di hemî madeyan de peyda dibe, di pîrtûkîn dibistanan de, ta zanîngehan jî. Ereb diroka xwe ya kesayeti, bi diroka İslâmî ve dihûne, û İslâm jê re nasnamâ wî ye. Lê ya ji me re lazim, ew ci dixwazin di van Dewletê han

Gurê Li Ba û Kewê Li Pa

ligeñ hin sivilen kurd.

Diji vê pîvajoya hovane, tu şermazkîrin nehatin ragihandin, ne ji layê hikumeta herêm û ne ji layê hikumeta federal li Baxda.

Turkyâ li Başûrê Kurdistan'ê dinere wek "Baxçeyê hewşê" û nabe ku tu mar û túpişk xwe di wî baxçeyê de veşîren û şevê ji xwe re bikin perdeya êrişan.

Amerika ji alyî xwe ve, li PKK dînere wek rîxistîne pabend û kara ku piştî ve tê girêdan lê tenê li Sûrya û tenê dijî Diîş (Da'ış), û ew ji hêza YPG xweş e û hevrîziyê pê re dike lê ew qet nafejîrîne ku PKK hêla sor derbas bike.

"Bizmarê Qendil'ê" ku ji mêj ve di diwarê Başûrê Kurdistan'ê de kuta ye, bi piştgiriya YNK û Goran, şoreşê dihinêre bi réya vehejandina rejîma siyasi li Kurdistan'ê û tevra-kirina kêşeyâ serokatiya herêm û hewlîdanen (kantonkirina) herêm li gor ramânen (Netewa Demokrat) lewra Amerika (dostê YPG li Sûrya) ruhniya kesk da gûr bor ku hêlinâ kew li Başûr borduman bike bi misogeriya ku muwek ji riha Ayatullah li Tehran'ê naheje nemaze pişti "Rêkeftina newewî" di navbera herdukan de.

Di nerîna min de, armancê pîvajoya Turki dijî PKK ev bûn : - Ardoğan bi xalekê bi ser Demirtaş bikeve nemaze ku Turkyâ çavenerê hilbijartinê beruwît e.

- Netewperîstên Turk pê razî bibin çiku wan ji mêj ve dixwest ku Turkyâ destê xwe yî dirêj rapêce û çavén PKK şîl bike.

- Rola PKK li Başûrê Kurdistan'ê kêm bibe, û "Cemîl Bayîk" fêm bike



Ibrahim Xelîl

ku ew li wir - çiqasî dirêj bike - mîvan e ne xwedimal e.

- Tamponêkî li hindirê Sûrya çê bike û barê penaperan li xwe sivik bike. Bê guman, Amerika hevala berjewendîyen xwe ye, û ev berjewendî li Sûrya li û Iraq'ê ne yek in. Ew li "mafî ciranî" dipirse berî "mafî milletan", û çiqas leşkeren te li ser erdê hebin gerek ciranî te (nemaze ku dosten Amerika bin) razî bin ta ku Amerika hevkarê te be (nimûneya Yemen ku leşkerê Hûsi li ser erdê bûn lê Si'ûdiyê ne razî bû).

Ü bê guman ji ku tu hevkariya stratifiyî ayindefî di navbera Amerika û PKK de çenabê ji ber ku bingeha ramyâr ya PKK bingehêke nîv marksist û nîv anarşist e, û Amerika, ku kapitalîmew ew kiriye dîlewteke gewre, li vê felsefeyê dinere wek dijminekî reş ku cengâ dijî wî cengâ hebûn û nebûn yê.

Lê ji aliyekei din ve, irorj PKK li Rojava erd girtiye û pala xwe daye sed hezarên dilxwazan ligel makîneyeke ragihandinê ku ji ya hin dewletan pêşketitir e, lewra ci kesê ku ji xwe re dibêja ku (PKK-PYD) dûvíke ji rejîma sûri re û ewê pê re biherise, ew di xeweke şérîn de ye.

Aya Çima Xencera Mîr Celadet Gazin Jê Dikirin

Bi boneya bîranîa koça dawî ya Mîr Celadet Bedirxan

Mîr Celadet Ali Bedirxan di yek ji çirokên xwe de behsa gazinê xencera xwe dike, çirok bi navê "Gazinda Xencera Min" e, ev çirok di kovara Hawar de hejmara 12 rîkêşî 27 Çirîya Paşîn 1932 belavbûye û Mîr Celadet wê dike diyarî bi Mamoste Tewfiq Wehbî beg ku wî bi mamosteyê xwe dide nasîn û destpêka çirok de dibêje: "Ji momosteyê min ê xweşewist û hêja Tewfiq Wehbî Beg re."

Bi dûve Mîr Celadet di çiroka xwe de dixwaze rewşa xwe bi xwendavan bide nasîn ku wî dest ji xencera xwe berdaye û dest bi hilgirtina Pêñusê kiriye û ew mijûli xwendin û lêkîlonîn li ser ziman û wêjeye Kurdi bûye, bi şeweyekî ku hesinê xencera wî zingar girtiye, pîrhevakan tevîn xwe li ser ava kiriye, û di ser wê re diçin û tê, Xencer li ser pîrtûkhanê ye û Mîr Celadet ti karî nema pê dike, heta rojekê pêñusa wî ko dibe û dixwaze bi kwîzanekî wê tûj bike, lê li kwîzan digere nabîne, destê xwe davêje xencerê ku pê serê

Kurd û Guhertinê Rojhîlata Navîn

"Kurd netenê hewcedarî piştgiriya hevpemyana Emerîkî û dewletê rojava ne, belê giringiya wan bi yekîtiyê heye û yekrêziya mala kurdî pîwîst e"

Bê ku ev dewlet venasînê bi mafê wan bikin wekû millet xwedî xak û ziman, tenê bi çavê netewek biçûk lê dinêrin, û setemkarî di derheqê wan de bikar tînin. Lewra kurdan qurbanîyên mezin danîn, û Cînosayd ji dijî wan hatine bikaranan, lê Kurd ji daxwazan xwe vene-geriyan û serî neçimandin. Ü deskeftên herî mezin ku Kurdan bi cî anîn, û venasînek cîhanî dabîn kirin, avakirina herêmek Kurdi li İraqê û pêşketina vê herêmê di warê abûrî û avayı de bi taybet pêkveyîjana aştiyanci bi hemû netewan re, bû se-dema nêzîkbûna dewleten cîhanî ber bi Kurdan ve, lê ev deskeftînîn ku Kurdan li İraqê bidestixistin dibe ku metirsiyê li ser perçeyen din çêbîke bi taybet pişti ku herêma Kurdistanê mijara serxwebûna Kurdistanê da-xist rojeva İraqê de.

Herwiha Pişti kontrolkirina beşekî mezin ji İraq û Sûrî ji alyî rîxistîna Da'ış ve, û gevîn wan bi avakirina dewleket İslâmî li herdû dewletan, û pêkanîna komkujiyan di derheqê kêm netwan de, bû sedema piştgiriya welatên Rojava ji Kurdan re, û destpêka vê piştgiriye li Şengalê derbû dema ku Amerika dit ku Da'ış bi kontiolkirina wê ji Şengalê re metirsiyek li ser Kurdan çedike. Amerika û hevalbendîn xwe odehyeke oprasîyonê ava kîn bo şerî Da'ış di riya asîmanî re bê kîn.

ji bili çek û cebîlxaneyen ku ji Kurdan re hatin pêşkêşkirin, hin dewleten Rojava kesen pispor di warê leşgeri de ji şandin bo rahînana hêzen Pêşmerge, û ev hemû bûn sedema guhertina rola şer ji



nexwest ji min bibhîze min ew li qâlikê wê vegevan, wê ji xwe ker kir û guh neda min.

Mîr Celadet di çiroka xwe de peyak-mekê dîghîne Miletê Kurd ku xebat tenê bi Xencer nabe tevi ku Xencer ji pîwîstiyek mezin e.. pîwîst e pêñus û Xencer dest bi dest bin. Mafê xencera Mîr Celadet hebû ku gazindan jê bike lê Mîr Celadet dizane ku xencera di destê nebawermendan de be bê süde ye, lewma wî xencera xwe danibû rexekî û karê avabûna hismîndiyi Kurdperwerî dikir da ku hilgîren xencerin bibin xwedî baweriyek Kurd û niştimanperwer. Hewlîr 13.07.2015



bergiriyê ber bi êrîşkirinê ve, kurdan bi piştgiriya ba-lafîren hevpemayanî dikarîbûn metirsiya Da'ış li ser Kurdistanê dûr bixin, dêmek xuya dibe ku Emîrîka giringiyeke mezin dide Kurdan, û bergiriyê di ber xaka wê ji de dike, bi taybet pişti ku gîhişte wê baweriyê ku kurd dikarin parastina hemû ol û kêmnetewan bîkin bê cuðayî. Lê netenê li İraqê li Sûryê ji piştgiriya Kûrden hate kîn ji aliye hevpemayanî, û cara yekem balasîrên wan Da'ış bombe-barankirin li Sûryê, li bajarekî Kurdi bû li Kobanê, ev tê wateya ku Kurd dikarin şer di ber cîhanê de bîkin, û wan hebûna xwe li ser zemînê ji xelkê re diyar kîn, û parastina wan ji hemû ol û ayinan re, hişt ku bibin dostê Emîrîka.


Kurd ûro wek hêleke sor têne nasîn di nava Rojhilata navîn de, herwiha pîrsek diyar dibe gelo wê Kurd karibin sûdeyê ji vê derfetê bigirin û nakokiyê xweyî navxweyî bidawî bîkin?

Gelo wê ew di riwê hewil-danê hin dewleten herêmî yê ku lev û xebatê dîkin di nava kurdan de tenê bo yekrêziya wan ava nebe !!! kurd netenê hewcedarî piştgiriya hevpemayanî Emerîkî û dewleten Rojava ne, belê giringiya wan bi yekîtiyê heye û yekrêziya mala Kurdi pîwîst e divê rewşa ku Kurd tê de derbas dîbin, dêmek li darxistin şerîne kongirê kurdî li ser asta her çar perçê Kurdistanê dikare nakokiyen çaresere bike û hêviyê mîletê Kurd bi cîbîne.

Gotarê Weşandî Nerînê Xwediye Xwe Ne

Mihemedê Seyid Husê...

Bavê Gotina Kurdî A Resen Li Rojava.. Dilê Xwe Ji Xerîbiyê Vedike



- Mixabin kesên ku me hez ji wan dikirin iro berê xwe ji me guhertine, wisa pelên wan ji darê weşiyane, mîna kulîlka cilmisî bi ser xwe de diponijin.
- Ez ji xwe, te, û tevan re dibêjim: Ta ku rêvebiriya saziyên rîwefermî yên zimanzan di Kurdistaneke serbixwe de çênebin, wê ziman di sergerdan û bendemana çaksaziyê de li ber bizavê tekakesane berxwdana yekrêziya yekzimanî bike.
- Di vê qûnaxa ku Kurd tê de dijî, tîmekî baş ji rewşenbîr, nîviskar û ronakbîrên ekadîmîsyon, yên wêjeyar, kêşegir, konevan, firehzanîn û pêşzan di navgîna rewşenbîriya Kurdî de li derve û hindirû peyda bûne.
- Her di wê baweriyê de me ku rîjeke pêşîwar ji ronakbîriya Rojavayî Kurdistanê ya lezbîr û hemdemî, dê van gireft û kêşeyên alozewîst li pêşerojê çaksaztir wergerîn.
- Min jî mîna Kurdekkî êşnas û xemxur bi lezgînî komek ji rewşenbîriya Kurdî bi texmîn ya serbixwe vwexwendî rawêjkiyeke navxweyî kirine, bi niyaza ku çend rewşenbîranji navxwe hilbijêrin, da ku nûneriya rewşenbîran di kongerê ENKS de bikin, lê mixabin her (kurmê darê ji darê ye).

1 - Nîviskar, Helbestyan, û ro-namivîs Mihemedê Seyid Husê kî ye.. Kurtenasın?

Yê ku hemî arezû û amanc, xwezane û mebest li gel yadigarêñ zarotî, di naveroka pirtükêñ xwe de kedî kirine, ji nîv tavşorkeñ Rojava min tîrjîn Rojhilatê pêşwaz kiriye, demdar xewnan bi keskesorê dibînim, ji rewbanjeyâ zimanê resendérin, bi çêje hevoksaçiyâ min kezîyen helbestê hûnandîye, ji tûjawirê pendeyarêñ hozan û tevdezan, ji awazîn şalûr û bibilan, ji reng, deng û dimenê xwerista bîhuştâ welat, resenwarê xoşewist bi ser sîmboliya evînê vebûme, ji nîv rûpêlén pirtükêñ bilîmeten fe-rezân û êşenâs, kargorî û dûrbîn, ji gendeliya tege, tîral û tembelan, derûnlawaz û keysebasan, hel-perest û xwetenparêzan, min wek stûbarî pernsipa xwenasiya tevareyî rîbâz kiriye, ji gencîneya metelokêñ berya, çand, kultûr û rîzîkên civaka Kurdi, ji nanê tîsi û kavîlên dîlén hejaran, min gav daye sirûda nasnamayê, ji asoyen teqla fira teyrê baz, ji nav tarîewrên seqa û mecen sitemî û qilixdîriyê, ta ku ji min hatiye wateya azadiyê hemdemîtir şîrove kiriye, mîna Kurdekkî zimanhez, xameyer û wêjedost, mirovnaş û astîxwaz, çekdariya pêñusê bo keşeya gelê Kurd lawen hemrahêñ xwe, ligel mafê rewa û erkzeza di tekoşina siyasi û astiyane de destegul hilbijartîc ez im.

2-Pişî sê salan li welatê xerîbiyê, Bavê Reşîd bêriya şevbuhêrkêñ Qamişlo, ciyatê nîviskaran, pirtükhaneyâ xwe, û gundê Til Erbîd nekiriye?

Roja cejna newrozê 21 avadar 2015an ji ser kohê çiyaki Ewropa, ronişti li ber pêñen yadigarêñ şûnwarê xoşewist, di bêganeya penberiya cankuj de diponijîm, reng, deng û dimenê cîgêhê rojzayîna min pelemañ hest û newaziyê min dibûn, lixêvîn omidewar di helkefta Newrozê, cejna serkeftina gelê Kurd û helwesandina koledarê noke Zehakê Farisi de, wêneyê qehremanê serhêldêr Kawayê hesinkar li bînahiya çavan, bir û boçûnê min dixircin.

Tel Erbîd gundê ku lê hatime rûyê dinê, nemaze ku kevneşopa bav û kalan Mad, Mîtan û Orkişî koka kur-dewariya resen di pesar û hîrikên xwe de gencîne kiriye.

Qamişlo tavşorkeñ Rojava û tîrjîn Rojhilatê, nema pêşwaziyân pê re dikin, xewnenâ ku bi keskesorê ditîne, bîna kulîlken beyaran û gula lîvîtenik, gerdena zérin û vêhûndina gurmîkîn keziyan, yê ku di ferhenga bîrîkirinan de şewtiye, ariya ber tenûre û toza ser bilûrê, pirtükêñ ku derd û êşan dixwînin, gernejîna ku yadiyê cejn û sersaln, pêşbîniyê pêşerojê çaklewend û gesbîn dikin, ji wan herdî stêrkêñ çavêñ xumari, lixêvîn xwekejtinê

ji nû ve li bîrê vejentine, kula çerxê heydîtinê û şikestina merbendêñ mişextinê ew e, ku careke din em li kavîlêñ resenwarê xoşewist vejerin. Qamişloka evînê bûka şaran li Rojavayî Kurdistanâ çaklewend re-senwarê bê hempa, kela girî di zengelorka min de aşê hiştiye, zerger-nejîna heyaman hevrûşî serlêvan bûye, zîmarêñ çiyayen Kurdistanê ji bin qîpaxen çavêñ şilove şîn û şahî li min şîyar kiriye, komeçînêñ rewşenbîr û nîviskaran râberî pirtükhaneyâ min diavêtime hasa guflugoyê, mîna filimekî cengborî çaklewend şewat û wêaranê, berbat û haygariyê cenosaydkirinê di ber çavêñ min re derbas kiriye, givalekîn ewrê restarî û xwezaneñ aşopiyane gumanen min nikder kiriye, wisa bêhîncîkiyât û ji qiramketî gefen nîhîni guvastime, min dikir ji iyarew xwe baz bidim nav seqa û mereñ emadebaşiyê.

3- Li gor tê zanîn Mihemedê Seyid Husê di temeneke dereng de dest bi nîvisâ zimanê Kurdi kiriye, sedema vê lîvegera dereng li zimanê dayikê çi bû?

Bav û kalen me stiran û helbesten xwe bi toza xwelireshkî nîvisandine, éca gelo ez û iro ji diwêta kijan destaneyan bi hestiyêñ kijan evsaneyan navê xwe yê wenda bîpe-sinînim. Dêmekî tu maye stiraneke destaneyi li ser lîvîn dengbêjan, li ser eniya me her maye birûşek jî evsaneyan, xaleke ronîdar li ser tilikan, keziyeke veçirî li ser milê helbestê, bi heman tîrjîn evsaneyi em dê tarîewrêñ ku mîna zîyayen maran xwe li newqa te rapêçane bîferikîn.

Ji sala 1957an ve bi saya Xwedê jîxwêş bavê xwe Seyid Husê, mîna netewperwerekî dilsoz û nemekdar, pismamî wî helbestvanê gewre û zimanî gorbîhuşti seydây mela Ehmedê Nâmî, û dostaniya wî bi şasiwarê helbesta Kurdi seydây zindar Cegerxîn re, bi taybetî şevbuhêrkêñ Odeya gundê Tel Erbîd cîgêhê rojzayîna min sala 1943an, nemaze ku nîfşê ji me mezinti diwanen wî dixwendin û distiran, herwiha ez ji hîni sertipêñ peyva zimanê zîlnakî bûme, û ji hîna ve pê dixwînim û dînîvisinim, lêbelê tenha ji sala 1994an ve, min berhemêñ wêjeyî hemecire li ser rûpêlén govar û malperêñ Kurdi weşandine, û di hemî dabas û babetên pêvedarî keşeya gelê Kurdi ya siyasi, çandî û ronakbîrî de nîvisandiye?

4- Di nerîna te de wêjeyâ Kurdi û bi taybetî roman di çi asteyê de ye?

Herwiha ji heman sala jorgofî ve û ji berbanga zayna makpartiya Kurdi ya pêşeng ve, hemahengî karubarê réxistîn û siyasi bûme, û ji hîna ve lixêvîn hesten netewî li zaroitiya min bûne mîvan, pêkve ji yekser behremendiya afirandina wêjeyînî, coş û pêşbaziyeke gesedar û piromid dane min, ku bi zimanê

5- Min pirtûkeke gotarêñ siyasi bi navnîşana (dîdevaniya Dîrokê û Yadîgarêñ Çirokê) ji 3 besan li ber çapê ye.

6- Pirojeyê romanekê bi navnîşana (Bîhûr) herkêm ji 2 besan li ber destaya ye.

7- Pirtûken te yê çapkirî çend

û binîvisinim, herweku min dilşad û kamîran pêşbîniyên pêşrojê, bo ezmüneya nîvisnadina zimanê Kurdi bi şanazî li gel dersefîn kêmpeyda gerdenkirine, lêbelê pir daxe ku di heman basîkê de şepela serdemê ez û gelek ji gencîn netewperwer, di nav stirdirkêñ qenderxeyen ramanen sosyalzîmê û partiya komonist de perpitandine, û di encamê de min ji 20 sal ji temenê xwe xîş û bêber berdane.

4- Dijwartîrîn celebê wêjeyê roman e, ci sedemîn hişt ku tu berê pêñusa xwe vê dawiyê bîdi roman?

Heçî roman mirêka civakê û banebalaya çand û wêjeyâ gel li şuna medya desthilata çaremîn ya yekemîn gewde dikî, asoyan bersefîrehtir di hemî dabas û babetên ramani, pendegoji, serboriyê dîrokî û ferhenga şewzariya nûjeniya ziman li gel çanda rîzîkên civakî li ber romanîvis vedike, bi hûrbîni xwe dirapêç û paleya zagon û penden berya dike da ku naveroka deqêñ xwe pê bixemiline, zimanrewabêje û sunmayen çand û kultûra bav û kalan, pê der pê xwe di navgîna reseniya çejepiyen ronîdar û dîrîn de dirapêç.

Bê guman yê ku ji min re bixwîni teçez wê çaktir bizane, bê çendî û çawa min mijaren pîrâli û bûgîn, gireft û giringirin keşeyan, di, êş û dîrden cîvakê di hemî hîlekareñ jiyanê de hingavtye, bi hemî rîawayen derbirin û râvekirinê li ser tabloya xaknîgariya navdewleti zîkûpiş qulaptîye, hemî zîndîwarêñ ku li ser xaknîgariya gerdûnî dîjin, rîjîm, nîjîd, netew, réxistîn, ol, dol û dewlet li gel romanê, di navnîşan hemecire de tev raçavî xwêneren xoşewist û hîja kiriye.

5- Pişî derketina te ji welêt, te ci berhemêñ nû nîvisandine, nave-roka wan ci ye?

1- berhevokeke helbasta nûjen... Welat bîhûta min e.

2- Wêjennîşen Hilbijartî... Deqêñ Paxşane.

3- Ziman û navedar. Kevneşop, cî û war. Helkeft û Tekosyar.

4- Dengvedana rasteqînê.

5- Min pirtûkeke gotarêñ siyasi bi navnîşana (dîdevaniya Dîrokê û Yadîgarêñ Çirokê) ji 3 besan li ber çapê ye.

6- Irojeyê romanekê bi navnîşana (Bîhûr) herkêm ji 2 besan li ber destaya ye.

7- Pirtûken te yê çapkirî çend

û zîlnakî bûme, û ji hîna ve lixêvîn hesten netewî li zaroitiya min bûne mîvan, pêkve ji yekser behremendiya afirandina wêjeyînî, coş û pêşbaziyeke gesedar û piromid dane min, ku bi zimanê

8- Her demekî em pirtûkeke nû di fîrbûn zimanê Kurdi de dibin, û her yek li gor xwe û jêhatibûna xwe dînîvise, bê ku li jêderin xurt û zelal vejerin, ev yek ziyanekê zor digihîne ziman, tu ji van ke-sar re dikarî çi bibêji?

Ez ji xwe, te û tevan re dibêjim: Ta ku rêvebiriya saziyên rîwefermî yên zimanzan di Kurdistaneke serbixwe de çênebin, û şewzariya zaravên Kurdi di zimanekî rewabêje, latinî û rîwefermî de cibeci nebe, wê ziman di sergerdan û bendemana çaksaziyê de li ber bizavê tekakesane berxwdana yekrêziya yekzimanî bike.

9- Xwendevan û şopîneren go-atrên Mihemedê Seyid Husê dibêjîn du têbîniyên giştî finin zi-man; yek ji wan dirêjbûna gotarê, ya didawn gotinê li xirû Kurdi... gelo ev di cihê xwe de ne, û cîma? Yekem: gelî bira xwênerê xoşewist hîc nadim mandelê ku herdû têbîniyên we cigirti ne, lê ku mîrov kul û derdîn gelê Kurd li ser tere-zuya sinc û nîhadê mafnasiyî mirovaniyê baş biteqîline, bawer im ku gotar rûberê zeviyekî bigire gereke xwênerê keşegir û xemxur gotarê tip li dûv tipê bixîne. Duyem: bi kurtî naxwe ku li pêşrojê em Kurdistaneke azad û serbixwe dixwazin, yekser gereke zimanekî rîwefermî yê gotarê, alavên ragîhandînê, rojnamegerî, tv, Îzge û pirtûkê, dibistan û zanîngehê peyda bikin, bi taybeti ku di rîza zimanê cihanê de cîyekî ûz pêşîwar bigire, dizanîm stûbarîye wa tekakesane xîş û kêmencame, lêbelê bi hîvi me ku li pêşrojê bi hevkariya zimanzanen terxanas û pêşan çiraxan li çaresiyye bedin.

10- Ziman û Navedar. Kevneşop. Cî û war. Helkeft û Tekosyar.

11- Şevçiraxên Çarmedor.

12- Şevçiraxên Çarmedor.

13- Dengvedna Rasteqînê.

14- Pirtûkeke din ji bi navnîşana (Dîdevaniya Dîrokê û Yadîgarêñ Çirokê) ji 3 besan li ber çapê ye.

15- Irojeyê romanekê ji bi navnîşana (Bîhûr) herkêm ji 2 besan li ber destaya ye.

16- Tava Mirinê... Roman e li ser raperina Avdar 2004an ya Oamişlo bûka şaran.

17- Kurdishî Helbesta Min E.

18- Welat Bîhûta Min E.

19- Wêjennîşen Hilbijartî... Deqêñ Paxşane.

20- Payizxêra Hêsiaran... kurteçirok.

21- Tava Mirinê... Roman e li ser raperina Avdar 2004an ya Oamişlo bûka şaran.

22- Kurdishî Helbesta Min E.

23- Gernejîna Rokê.

24- Awazîn Evînê.

25- Halana Qamişlo.

26- Şeva Dirêj.

27- Kurdishî Helbesta Min E.

28- Welat Bîhûta Min E.

29- Wêjennîşen Hilbijartî... Deqêñ Paxşane.

30- Payizxêra Hêsiaran... kurteçirok.

31- Tava Mirinê... Roman e li ser raperina Avdar 2004an ya Oamişlo bûka şaran.

32- Kurdishî Helbesta Min E.

33- Gernejîna Rokê.

34- Awazîn Evînê.

35- Halana Qamişlo.

36- Şeva Dirêj.

37- Kurdishî Helbesta Min E.

38- Gernejîna Rokê.

39- Awazîn Evînê.

40- Halana Qamişlo.


QEDRİ CAN

1911-1972

(Jiyan û Berhem)

Dilawerê Zengî

Serokê Yekîtiya Nivîskarê Kurd-Sûriya.



Jinenigariya Qedri Can: Çaxê mirov bixwaze lêkolinekê an nivîsandinekê li ser helbestvanekî an nivîskarekî çêbîke, berî her tişî, pêwîst ve mirov, li nîvis û berhemê wî vegere û serpêhatiya jiyanâ wî nas bike, û li hin çavkanî û jêderan vege. Wê gavê ez bawer im kare mirov wê tekûz û pir hejâ be. Lê çaxê ku, tu nivîsandin li ser jiyanâ wî helbestvanî/nivîskarî tune bin, û berhemê wî, di kovar û rojnameyên ku di destpêka sala sihî de derketibin û di yek pertûkê de nehatibin cîvandîn, û tu çavkanî û jêder-pêvi çend gotarok- li ber destan tune bin, ez bawer im wê karekî ne pir hêsan be.

Yek ji van helbestvanan helbestvanê me Qedri can e. Berhemê Qedri canî nehatibin komikir û li ser jiyanâ wî pir têvîlî hebûn. Em bawer in nivîsen nivîskar ayîna hundîr wî ye. Berhemê Qedri can rûpelin ji jiyanâ wîne. Bi taybetî ew berhem û nivîsan-



dînênu ku mîna biranînê zarotiyê bi awayekî çiroki hatine nivîsandin. Di baweriya me de, çavkanî û jêderê rast û dirust berhem û nivîsen wî ne.

Qedri can, ew bixwe ji xelkê Dêrika çiyayê Mazî ya paşroyê bajarê Mêrdinê ji Bakurê Kurdistanê ye.

Piraniya nivîskar û rewşenbîren ku li ser jiyanâ wî nivîsandine, û bi taybetî li ser diroka zayîna wî, ne wek hev gozin. Herdû nivîskarê Kurd M.Uzun û Fîrat Cewerî dibêjîn: "Di sala 1919-an de hatiye dinê", lê mamoste Izedin Mistefa Resûl mîna Rewşen Bedirxan dibêjî: "Di sala 1916 -an de hatiye dinê". Diyar e, ku mamoste Izedin Mistefa Resûl ev dirok ji pertûka Rewşenê (Rûpelin Ji Toreya Kurdî) wergizte. Rojnameyan Hesen Heye di rojnameya (Dimoqrati) û li ser zîmanê malbatla helbestvan gotiye: "Di sala 1911-an de hatiye dinê", Nivîskar Edîb Nadir ew jî di gotara xwe de ya di kovara (Metîn) de daye belavkirin dibêjî: "...Qedri can di sala 1911-an



de hatiye dinê û di sala 1972-an de mihiye", lê nivîskar Sîleman 'Eli of gotara xwe de ya di rojnameya (Armanc) de hatiye belavkirin dibêjî: "Qedri Can di destpêka bîlîska bistan de hatiye dinê", bê ku dirok bê ci bîke, lê Pirofesor Qenatê Kurdo di pertûka xwe de (Tarixa Edebiyeta Kurdi) de,



Ji Erebî: Ekrem Osman

Bi ser şewqek sermedi ve
Xwe pelû dikirin
Dehkîn ronahiyê
Ji ber kûrahiya bendewariyê
Jibir dikirin
Di çarîya dawî ji hêviya bendkiri de
Bi bêgunehiya xewna xweş
Mina peleke Sundiyânê
Li ber bayê "Ciadê"
Ber bi mayinê ve, ketin
Mîna pelên ku di payizî de
Li ber ba dibin
Pêlén hov li qiraxen rojê
Bi qulikin kîna zikrê re
Li hêviya mermîra laşen wan bûn
Ü hin ci?

Ma rîya ber bi Xwedê ve

Bi xwîna Xezalan dîvê avdan?

Buhuşt, di aşopa ehmeqiyê de

peyda bûye

Agir dilovaniyê tenê li peresten

xwe nake.

Gava Dêya Min Pêxwas

Sexir Meçel

Ji Erebî: Ekrem Osman



Kolanen Helebê lihev dixist
Bi ser min venebû
Ez di hemû riwan dixwendim
Pîrsa min ji hemu keviran dikir
Gava wêneyê miriyen ku li ber
çavên wê derbas bûn, diditîn
U gava ji nebüne ta bêdawiyê
Li dergahan dida
Dêya min bi ser min venebû
Tenê di sibeha szazdehê Avdar
Di demjimêra dehan de
Gava derket serdana gora bavê
min ê şehîd bike
Teyrên berateyan bala wê kişand
ser termê min
Ê ku nêzîkî gora wî bû

Birano .. Hevalno



Dr. Şepal Şelal Osê- Elmniya

Gazî û sed qêrîn û hewar

Welaletê min dîse iro birindar

Rondik xwîn e dîse ev car

wan Şehidan li Qamişlo rakirin bar
mixabin agir li wan nebû sar

û ew xwarin mîna gurekî har

Gelo em kengî ji xwe radikin çar?

Birano ..hevalno.. zanano ..

bi bawer bin em ji dil nekin kar

wê bikeve ji qurim de ew dar

Na .. Na

bila em bidin dil û rewan

û serxwebûn nemîne raman

Biraderno hişyar bin û bikin

armancı niştiman

û tenê bi birati yekdestî ava dibe

Kurdistan

Ava bikin Kurdistan *



Bi riwekî melûl li katjimêra destê xwe nerî, ew li ser Dwanzda bû, xelekên çavên wî fireh bûn. Ü dema dengê zengil kete guhê wî de, bi lez da rê, da pêşîya gavê xwe di şûşa derî de wêneyê xwe dit, weke rewrekî, dilê wî lihev ket. Destê xwe avêt çenglê derî dilê wî ji ber destê wî lihev ket, meşîya bêhna xwêdana wî lê geriya, dilê wî ji laşê wî li hev ket, dilê wî ji ber rewşa jiyana wî tevî lihev ket giha mal, gazindan xwe dabûn pişta derî dema wî derî ve-kir, tevan bi hev re xwe raperandin singa wî derket ji hundir, gewdê xwe li ser xakê raxist û devê xwe kir axê û bang kir: Xweda.. gîyanê min bib...gîyanê min bib...hewar ta bi xwelyê jî xwe li serê min nake.

Kêlîkekê bê deng ma, dengê kenê zaroka wî ji hundir hat bi lez xwe da hev, toza li ser xwe paqîj kir û careke dî berê xwe da hundir, zaroka wî bazda xwe avêt himbêza wî, wî ji ramisanek li ser rûkê wê danî û pêre keniya, di wê kêlikê de kulen xwe tev jîbir kirin û di dilê xwe de got: De bila ez nemrim... hîna hêvî hene!!!

Metê Megrî



Şefiq Isa

Tu firmeskîn xwe yên elmas
Ji wan çavan nebarîne
Li ser xaka hemî pîroz
Bê dengê berz bililine
Û rahêje gulen rengin
Li kîla min bialîne
Şehîd im ez
Li ser gornê bikin şahî
Nekin şînî..
Megrî metê
Min ranekin nû raketim
Nêrgiz li hawir kehniyan nû derke-tin
Sîter di tariya şevan de vêketin
Qumri li ser ferxên çeleng
Dil bi aramî dilitin
Xwenêne me hûnandin biken
Nema bi kul dihilqetin
Megrî metê..
Nema ji daran pel ji agir diweşin
Wê simbilên azadiyê di sing jîne
bîxusin
Vaye li govenda evînê bi hezaran
dîmesin
Xwîna me büye xecxecoka tev li
welaletê me ges in
Meta delal..
Zeviyê gulen bê av dimîne çelmissî
Hilma dilê min wê bide
Li her cihî li her kesî
Lê rûmeta warê bedew
Di desten hovan nekevî ne çewisi
Da lê bijîn Kurd serfiraz
Ne çavên kîn û dexesi



Dibarin hêşirên çavan
Şehîdîn me ser milan
Ew barana ji dayikan
Ceger şewate ser wan.

Ev ci xake ev ci bêhîn e
Ma tu têr nabe ji xwîn e
Gor pir dibin rêz dibin
De vebe gulê bes birin e.

De hilat bibe roja welat
Pir pêşmerge bûne xelat
Dilên dayikan bike buhar
Edî bes e ev janên welat.

Kulîkîn Penaberiyê Sitrî ne



Kulîkîn penaberiyê sitrî ne
Kenê li ser lêva ..
Sext e
Biran e ..heval in
Lê ..em ci ne!
Em kî ne?
Di nerîna wan de
Em diz in..
Sextevan in
Em bê ol in..
bê êl in
Revok in..
bê keramet in
Li ser riwê xwe em ketin
Na kardêş..
na heval
Na bira..
na kaka

Em tev de xwendevan in
Jir in, lê bê şens in..

bê rîber in
Ji erwan em ketin cokê xwînê
Bê nas nekir rojek kînê

Binêre li qermîçenkê diya min
Bijmîre kesera..
ji Qamişlo ta vir

Her şev cane min li ser gora bavê
min e

Lêbûrînê dixwaze
Min ne çand gulek ji bo laşê wî

Hûrdemê .. dawî
Neditim çavê wî

Nepirsin çîma seqetim?
şevîn dirêj beramberî xwedê mest

im
Nepirsin çîma bê his im
wek avê li ser agir dirijim

Dibêje min tu kî yî?



Di wir re, çûm

Cihê ku di xwe de hilnayê û
bêsinor

Lingê ku min

Ew li ber şopeke têr-av winda

kiriye

Li wî geriyam, wek li tîrêjekê

Ku bêhna sıpî jê difûre,

bigerim.

Çi bela ye

Sist û tevizî

Bêhnek têrâ xwe fireh diçe û tê.

Sermaya ku hemî navêñ zirav

Lê têwer bûne,

Destê xwe yê ku ji befira vermirê
westîyât, dide hev

Wek ku di hêvîyê re, asê bimîne
riyek

Yan ku xuya nebe tiştek

Nizanîm,

Tiştekîku naşibe xwe di her
wextî de.

Dergehê ku bi xwe vedibe, min
davîje dûr.

Tirêna ku di ber gundan re kal
dîbe, min ditîrsîne, gazi tîrsa
min dike.

Siyâ xwe li cihêñ vala dibînim

Wek deqeke bi şewqê dagirtî

Yan baskekî bi zorê difire.

Kê gotineke xweş ji te re gotibe

Te birîn kiriye, wek hêlaneke dîl.

Çûyîn,

A ku bi xwe vedizile

Bi xwe teze dibe

Ev çûyîna ku hemî henaseyan
dafirîne;

Her çûyînek, nemanekê bêhawê
ye.

De min bikin

Wek ku hûnji min hez dîkin û li
min didin

Di ve rewşê de;

Min bidin ber hesab

Hesabê her tiştekîku min neki-
riye

Yan min bêhemdi xwe, ji ber we

kiriye.

Bi hev re bimeşin;

Ey tiştekîn diji-hev, tiştekîn wekî-
hev

Berîku

Wek tîfîlen sar ên buharê

Bi lepan

Bên nixumandin.

Buhara Kurdünde



Ev ci gotine? kî ji te re bêje buhar
kurdünde heye bawer neke û bêje:
Derew e !

û ki ji te re bêje serkeftin bê evîn
heye bêje: Derew e, iea pirs xwe
diafîrine; gelo kê buhar kîr payîz?

Ev ji tê wateya ku xwezaik surûşî
heye di hêla demen salê bêne guher-
tin. Ü bela em ji bir nekin ko her car
buhar ji esfîkî nûjen dibe û esfîk
carek din ji buharê tê afandin û
her wiha demsal têne guhertin.

Ü jiyan berdewam e ti cari naraw-
ste û çerxa felekê geh li jê re û geh
li jor e û serkeftin geh li sipan û
geh li tar e, û evîna yarê ji dilê min
dermakefta xwe. Lê dûn nêzîk wê
dem bê û em û hevdû himbêz bikin
û jiyan berdewam e bi sayer ser-saxiya
evînê û hebûna jîne ji ber ku
hin bingeha jiyan e! Ü ti cari jin
ne didümne ya eger jin ne tê de ba?

lê em jîbir nekin ku jin dayik e û
dayik evîn e û evîn himbêzkirine
û hevgirtin e. Bijî hevgirtin.
Lê carek din em jîbir nekin dayik
ziman e, û ziman şerîn e û şerîn
xwes e û xwesi jiyan e !

Ü dayik welat e, welat hêjey e,
xwînê û xwîn bingeha jîne ye

û jîn jiyan e û jiyan berxwedan
e û berxwedan evîn ye û evîn
yekîti ye û yekîti azadî ye û azadî
serxwebûn e û serxwebûn hebûn e
û hebûn ne dûmahiye, lê despêk e
û despêk evîn e û evîn himbêzkirine
û hevgirtin e. Bijî hevgirtin.

Welatiyek û Welat



Bûm beyanî dûrî welatê xwe

Koçber bû can û dilê min

Bîranîn wan rojê bê dawî man

Bîna valabûnê li kolana bîn dikim

Ax beyaniyê te çî kir